Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1199 | 28-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Goran Emîn: Saz enstrumanek şoreşgeriye, xwedî ruhekê taybete



Navenda Nûçeyan

**Goran Emîn jî navçeya Kelarê ye û hez û eleqeyeke zêde ji hunerê re heye. Ji ber vê çendê çendîn salin xwe fêrî lêxistina sazê kiriye û dibêje: "Saz amûreke şoreşgerî ye ku her tim ji aliyê mirovên şoreşger ve hatiye lêxistin. Ji ber ku giyanekê taybet yê sazê heye û bi ruhê mirovan re dibe yek."**

Hunermend Goran Emîn muzîkjenê sazê ye, ciwanekê gelek bi hêvî ye û xelkê navçeya Kelarê ya navenda Îdareya Germiyanê ye. Ew xortekê Yarsanî ye û di sala 1993'yan ji dayik bûye. 10 salin hînî lêxistina sazê (tembûr) bûye. Li Kerkûk, Silêmanî û Kelarê beşdarî kurs û festîvalên hunerî bûye. Wî li Germiyanê çendîn kes fêrî lêxistina sazê kiriye û hunerê weke beşeke giring di jiyana mirovan de pênase dike.

Goran Emîn hunermendeke ku dema dest bi lêdana sazê dike laş û ruhê wî têkelî sazê dibe û dikeve nav dinyayeke hunerê. Ev yek wisa li wî dike ku aramiyeke mezin bi wî re çêbike û saza wî bûye beşeke girîng ji jiyana wî.

Goran dibêje, ew di bin bandora çend hunermendên Kurd de maye ku ji wan Hozan Serhed, Ahmet Kaya, Mem Ararat û çend hunermendên din û hîtabê giyanê wî dikin. Ev yek bûye sedem ku ji bo rihetiya giyanî xwe fêrî sazê bike. Destpêkê xwe bi saza birayê xwe amûra sazê nas kir û paşê bi rêya YouTube û beşdarbûna kursên fêrbûnê fêrî sazê bû.

Derbarê amûra sazê de hunermend Goran Emîn wiha got; "Saz amûreke kevin ya mûzîkê ye ku piranî li Bakurê Kurdistanê tê çêkirin û gelek cûrên wê hene. Saza elektronîk, saza normal, kurt, dirêj, biçûk, mezin û li gor şêwazê lêdanê jî gelek cûrên din yên sazan hene. Saz amûreke şoreşgerî ye û şoreşgerekê weke Şehîd Serhed bikar aniye. Saz weke enstrumanên ûd û tar sunetiye. Ji ber ji van esntrumanên sunetî, saz xwedî ruhekê şoreşgerî ye. Ji bo fêrbûna wê, divê hûn pêşî qaîdeyên wê ji mamosteyekê fêr bibin."

Goran di dewamê de got; "Li sala 2014'an de min di Koma Aram de dest bi kar kir. Ev bû yekemîn karê min yê hunerî. Paşê li bajar, navçe û bajarokan ez beşdarî çend kom û festîvalan bûm. Naskirina sazê ji bo min pir girîng bû."

Hunermend Goran ji baweriya Yarsanî ye û hemû ferdên malbata wî di aliyê hunerê de xwe pir pêşxistine, şarezayên enstrûmanên mûzîkê ne. Bi taybetî jî xwîşk û birayekê wî bi heman şêweyî wî sazlêderin. Di dawiyê de hunermendê Yarsanî Goran Emîn bang li ciwanan dike ku xwe fêrî mûzîkê û enstrumanên mûzîkê bikin, dema xwe bi tiştên cûda ve vala derbaz nekin û wiha dawî li gotinên xwe anî; "Rêya hunerê gelek bi feyde ye, ruhê mirovan aram dike û me fêrî arambûyînê dike. Xeyala min ewe ku komeke mûziyê ya taybet bi sazê ava bikim. Min çend caran komên mûzîkê rêxistin jî kir lê piştre belav bûn."

# Hejmara destpêkê ya kovara 'El Oma El Demokratî ye' hate weşandin

Hejmara destpêkê ya kovara 'El Oma El Dimoqratiye' li Qahîreyê hate weşandin.

Di çarçoveya piştevaniya pêngava navneteweyî ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, bi pêşengiya mamosteyê dîroka hemdem ê Zanîngeha Demenhur a li Misrê Prof. Mihemed Rifat El Îmam û gelek akademîsyen, nivîskar û rewşenbîrên fikrê Abdullah Ocalan lêkolîn dikin, kovara 'El Oma El Dimoqratiye (Neteweya Demokratîk)' hejmara xwe ya destpêkê li Qahîreyê weşand.

Prof. Mihemed Rifat El Îmam ji ANF'ê re axivî û têkildarî kovarê got, "Demek bû ku li ser fikrên Rêber Abdullah Ocalan, meseleya Kurd û têkiliyên Ereb-Kurdan kovareke çandê ava bikin. Ji ber ku Rêber Abdullah Ocalan ji sînoran û hindikahiyan wêdetir li tevahiya cîhanê deng vedaye."

El Îmam bal kişand ser armanca kovarê jî û got, "Em dixwazin têkildarî pirsgirêka Kurd, pirsgirêkên Rojhilata Navîn û pirsgirêkên navneteweyî nêrîneke zanistî ya bi hevsengî pêşkêş bikin. Fikrên Rêber Abdullah Ocalan ne tenê ji bo pirsgirêka Kurd her wiha ji bo pirsgirêkên Rojhilata Navîn, beriya her tiştî ji bo pirsgirêka Fîlîstînê projeyeke giştî ye. Me navê Neteweya Demokratîk hilbijart ji ber ku li gel azadiya jinê û ekolojiyê mijara bingehîn a projeya aştiyê ya Rêber Abdullah Ocalan ev e."




## Gotarên kovarê

Di hejmara destpêkê ya kovarê de bi sûdwergirtina ji pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gelek gotarên dewlemend hatin weşandin. Lêkolîner Ahmed Mihemed Inbiyowe bi sernavê 'Ocalan... Di rexnekirina dewletê de rola fikrî', lêkolîner Dr. Elî Sabît Sabrî bi sernavê 'Projeya Ocalan esasê jinûve xwendina dîrokê ye', lêkolîner Hedir Mesed Etiye bi sernavê 'Dîrok û nasnameya Kurd... Li zanîngehên Misrê xwendina karên zanistî' gotar weşandin. Nivîsa 'Destpêk... Kurdistan bû' ya Dr. Seher Ehmed Hesen, nivîsa 'Di ser Şêx Seîdê Pîranî re 99 sal derbas bûn' a Dr. Mihemed El Seyd Şîlbî çend ji wan nivîsan e ku di kovarê hatin weşandin. Her wiha nivîsên Eşreqet Mihemed El Îmam û Şeyma El Şawarbî jî di kovarê de hatin weşandin.

Bi kamîreya Hemza Sêvo



# FERHENGA BIWÊJAN

**Serî bi pîvazê ye:**
- Pir ji hev kuştine.

**Destbelav e:**
- Pereyên xwe tiştên xwe zû ji destê xwe dertîne; li tiştên xwe xwedî dernakeve.

**Destê xwe lê berdaye:**
- Mal û pereyan pir bêsînor belav dike.

**Gula lesar e:**
- Ne girtî ye; ne destgirtî ye; tiştên malê naparêze; tiştên malê ne di cihê wan de bi kar tîne.
Li herêma Dêrsimê ji bo jinan tenê tê gotin.

**Havînê to xwar, zivistanê gû xwar:**
- Ji bo kesên amadekariya paşroja xwe nakin tê gotin.

**Heta heye şilik û milik, dema nema keser û kulik:**
- Heta rewşa aborî baş be lê dide dixwe, ji bo paşroja xwe nahizire, dema rewş nebaş dibe axînan dikişîne; li xwe dide; poşman dibe.

**Ji axê pirtir nîne, mar bi qinyat dixwe:**
- Tiştek çiqas pir jî be divê mirov israfê neke.

**Kodqulêr e /kodqulêriyê dike:**
- Tiştek xwe di destê wî de nagire; tiştên xwe, pereyên xwe ne di cihê wan de bi kar tîne.

**Mêr bikurtan, jin bixiftan:**
- Ji bo jina ku rewşa mala xwe li ber çavan nagire tê gotin.

**Şeş û bêş lê dide:**
- Ne mirovekî girtî ye; ne di cihê wê de bi kar tîne; bêhesab xerc dike; bê ku bihizire xerc dike; bê ku li ser paşroja xwe bihizire xerc dike, yan jî dixwe.

**Axayê ser tenûrê ye:**
- Tiştekî wî nîne lê xwe qure dike.

**Berî dide civatê, jinê dişîne liqatê:**
- Bixwe pir xizan e, lê xwe qure dike; haya wî ji rewşa wî nîne.

**Bixwe ne tiştek e hespê mîr bazar dike:**
- Bixwe xizan e lê weke dewlemendan tev digere.

**Dew nîne fir bike, siwarî tir dike:**
- Xizan e lê pir qure ye.

**Dew xwestî kodik bi şûn qûnê ve:**
- Dixwaze lê ji xwestina xwe şerm dike.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Rewşek wisa di lîteratura cîhanê de tune ye



Parêzerê Rêber Abdullah Ocalan, Omer Guneş anî ziman ku niyeta Tirkiyê tune ye ku di mafê hêviyê de gavan bavêje û got: "Mînaka rewşa Abdullah Ocalan li cîhanê tune ye. Êdî bi gotinê jî nayê pênasekirin."**R-3**

# Stêrkên meşa Azadiyê Şehîd Gulîstan û Hêro

Rojnemevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku li gorî zagonên navneteweyî hedefgirtina rojnemevanan sûcekî şere û wiha gotin: "Bêdengiya saziyên navneteweyî li hemberî hedefgirtina dewleta Tirk a dagirker ji rojnemevanan re tê wateya hevkariya wan di van sûcan de."**R-2**





Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1199 | 28-Tebax-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 'Çandina daran bingeha domandina jiyanê ye'



Jina ciwan a bi navê Cûdî Ibrahîm ku insyatîfeke kesayetî ya çandina daran li bajarê Qamişlo daye destpêkirin diyar kir ku hevkariya civakî bingeha serkeftina tevahî insyatîfan e.**R-6**



# Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî

Evdil Ezîz Husên helbestvan û evîndarê welatê xwe ku tevî êş û derdan ji welat hezkir û jiyana xwe û her tiştê giranbuha jê re terxan kir. Kurdistan li cem wî deriya dilsoziyê û cihê şahiyê bû, lewra wî helbestên herî bedew jê re nivîsand û bi tîpên zêrîn xweştirîn peyv jê re xêzkir û xweşiktirîn wêne li ser xwezaya wê ya rengîn û bedewiya wê ya balkêş nivîsand.**R-7**

# PDK'Ê Û HIKUMETA IRAQÊ HEVKARÊN DAGIRKERÊN XAKA XWE NE

Dagirkeriya Tirk ji bo dagikirina xaka Başûrê Kurdistan û Iraqê êrişên xwe dewam dike. Li aliyekî peymanên siyasî û aborî îmze dike, li ser ruyê erdê jî xaka Başûrê Kurdistanê û Iraqê dagir dike. Dagirkerî bi hevkariya PDK'ê û bêdengiya hikumeta Iraqê bi sedan kîlomitre ji axa Başûrê Kurdistanê dagir kiriye, bi sedan gund vala kirine û welatiyan jî işkence dike. Tevî ku dagirkeriya Tirk serweriya xaka Iraqê binpê dike û komkujiyan pêk tîne, hikumeta Iraqê û tevahiya welatên erebî û hêzên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe, bêdeng dimînin.**R-5**



# 'Yê ku tê darizandin ne Silêman Ehmed e, pênûs û dengê rastiyê ye'



Rojnamevan Zinar Yildiz da xuyakirin ku di demên dawiyê de li Başûrê Kurdistanê zext û zordarî hatiye zêdekirin, ji bo dengê rastiyê dernekeve holê.**R-4**

Ji bo jinê girîngiya xwe rêxistin kirinê
Nehîr pale R-2

Jinên Pêşeng di hedefê de ne
Zekî Bedran R-5


Li dijî Kurdan peymanek nû
Farûk Sakik R-5


Serdema têkçûna kovarên çandî
Kemal Necim R-7

# Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî, Misogeriya Civaka Exlaqî, Siyasî û Demokratîk e

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat PYD`ê, Emîne Bêrim diyar kir ku mijar û nirxandinên ser asta bilind hate nîqaş kirin, mijara dîblomasî ya herî girin bû da ku têkiliyên bi jinên cîhanê re bê xurtkirin û hêz kirin.

**Jîn Hisên/ Qmişlo**

Di dîroka 20`ê meha tebaxê sala 2024`an kongra sêyemîn Meclisa Jin a Partiya Yekîtiya Demokrat PYD li bajarê Hesekê hate li darxistin, bi drûşmeya "Felsefeya Jin, Jiyan, Azadî, Misogeriya Civaka Exlaqî, Siyas Demokraîk e" bi tevlîbûna zêdetirî 400 delege. Herwiha bi hazûrbûna saziyên Rêvebriya Xweser, kongra Star, MSD, Saziya Malbatên Şehîdan, bi hemû pêkhateyan.

Derbarê encamnameya Kongreya Meclisa Jin a Partiya Yekîtiya Demokrat PYD'ê endama Meclisa Giştî a Partiyê a Helebê Emîne Bêrim ji rojnameya me re axivî.

Emîne Bêrim di destpêka axaftinên xwe de bal kişand ser naveroka kongir û wiha got: "Nirxandinên ser asta du salan hate kirin, çawa meclisa jin karîbû di nava partiyê de xwe bi rêxistin bike tevî zor û zehmeyên ku herêm tê de derbas dibe. Kêmasiyên ku derketin di du salan de jî hate nirxandin û rexnekirin. Rexneyên pir giring li pêş bûn der barê mijarên birêxistinkirina jinan û nekarîbûna negihaştina hemû jinan di milê rêxistinî, diblomasî , kar û xebata di nava gel de û bi taybet di nava jinan de, di van mijaran de nirxandinên di astên



herî jor hatin kirin."

Emîne Bêrim wiha domand: "Nirxandinên taybetî ku çawabûna karibin jinên ciwan di nava meclisa jin de bi rêxistin bikin, ji ber ku ger jinên ciwan xwebirêxistin bikin wê demê meclisa jin jî xwebirêxistin dike û bi hêz dibe. Herwiha mijara hevserokatiya hevbeş hate nirxandin ku cara yekemîn partiya PYD'ê serkêşiya vê sîstemê kir û bû tecrûbeyek ku cihê xwe girt li her deverê hate rûnişkandin."

Eemîne Bêrim da xuyakirin ku jinên ereb li aliyê Dêra Zorê, Reqa û Tebqa daxwaza birêxistinkirina jinan zêdetir kir bi taybet li aliyên wan li gorî fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û xeta jina azad ev nîqaşên herî giiring di kongir de hate kirin û wiha domand:" Jinên ereb daxwazî li meclisa jin kir ku derbasî van aliyan bibin jiber ku wir hîn jin tên kuştin, di bin desthilatdriyê ne da ku bihêlin jinên li wê deverê jî xwedî îrade, hêz, fikir û îdyolojî bin. Beşê herî giring ew bû ku em çawa jinê perwerde bikin û pêşxistina zanista jinê di nava hemû civakê bidin belav kirin. Nîşqa ser vekirina Akadîmiyan ji bo meclisa jin hate kirin da ku zêdetir bêne perwerdekirin."

Emîna Bêrim wiha doman: "Di kongir de çawabûna Zagona Jinê di nava civakê bibe mijareke sereke ku em kaibin li gorî wê tev bigerin û kesên destên wan di kuştina jinan de heye bên ceza kirin; hate nîqaş kirin. Meclisa Jin a PYD roleke sereke bilîze di nava nivîsandina hevpeymana civakî û ya taybetî jinê û cihê xwe tê de bigrin. Herwiha di aliyê dîblomasî de nîqaşên pir girin hate kirin ku em karîbin di bin slogana (Jin, Jiyan, Azadî) ku çawa çirûska yekemîn di hundirê rojhilata kurdistanê de hate pêxistin îro em dibînin li Efxanistan, Hindistan û hemî jinên cîhanê di bin vê drûşmeyê xwe birêxistin dikin, lê em karibin di milê dîblomasî de wan jinan hembêz bikin weke partiya PYD bi taybet meclisa jin. Di milê dîblomasî xwe xurt bikin têkiliyên xwe bi hemû jinan bikin û wan jî birêxistin bikin li ser fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ku hiştiye jin bibe xwedî îrade, felsef, biryarên herî giring ji bo jinan bidin meşandin."

Emîna Bêrim wiha domand: "Piştî nirxandina rewşa siyasî, rêxistinî, perspektîfên rêber apo hatin xwendin , çalakiyên ku di van sala ne hatin kirin di senevîzyonekê hate pêşkêş kirin, pîrozbahî hatin xwendin, mekenîzmeya kar hate xwendin û li ser hate erê kirin, hilbijartin hate kirin, meclisek nû hate hilbijartin û 32 endamên meclisa jin di nav de yên kantonan de hatin hilbijartin û li ser hatin erêkirin.

Kongir bi encamnameyekê û hejmareke biryar hatin derxistin bi dawî bû:

**Biryarrên hatin derxistin evin:**

-Asta têkoşînê bilind bikin ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan ya fîzîkî.

-Li hember madeyên hişbir ku di nava jinên ciwan tê belavkirin têkoşînekê bidin meşandin.

-Di aliyê zansita jinê perwerdeyê girtî û vekirî li ser asta partiyê were vekirin.

-Civînên berfireh û biçûk di nava civakê de bidin meşandin bi serkêşiya jinê.

-Xurtkiria têkiliyên dîblomasî û dengê xwe bighêjin hemî jinan di cîhanê yên bi drûşmeya ( Jin, Jiyan, Aadî) ji xwe re kirin esas û vê sedsalê bikin sedsala azadiya jinê.

-Em hewil bidin û bibin alîkar ji bo bihêzkirina YPJ û HPC.

# Stêrkên meşa Azadiyê Şehîd Gulîstan û Hêro

**Roj Mehmûd/ Qamişlo**


**Rojnemevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku li gorî zagonên navneteweyî hedefgirtina rojnemevanan sûcekî şere û wiha gotin: "Bêdengiya saziyên navneteweyî li hmberî hedefgirtina dewleta Tirk a dagirker ji rojnemevanan re tê wateya hevkariya wan di van sûcan de."**

Di 23`tebaxa 2024`an de, di ecama bombebarana balafirên bê mirov ya dewlata Tirk li dijî wesayîta rojnemevanên çapemaniya Azad li navçeya Seyîdsadiq ya girêdayî Silêmaniyê du rojamevên jin yên endamên çapemaniya Azad yên bi navê Gulîstan Tara û Hêro Beha-Aldîn şehîd bûn.

Di derbarê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li ser Rojnemevanan, rojnemevana Radiyoya Xabûrê Mizgîn Hesen û Rêvebera Radiyoya Star FM Lîlav Hesen ji rojnameya me re axivîn.


**Hedefgirtina jinên rojnamevan**

Mizgîn Hesen di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Di 23`Tebaxa 2024`an de du rojnamevanên jin Gulîstan Tara û Hêro Behadîn hatin



Lîlav Hesen

hedefgirtin û şehîd bûn. Ev êrişa dewleta Tirk li dijî rojnemevanên jin li Başûrê Kurdistanê bi rasthatina êrişa ku li ser karmendên JIN TV ya beriya salekê, pêk hat. Hedefgirtina rojnamevanan ji aliyê dewleta dagirker ve tê kirin, armanc jê rastî bê veşartin û heqîqet di tariyê de bimîne. Li Başûrê Kurdistanê him hedefgirtina rojnamevanan him girtina rojnamevan Silêman Ehmed ku ev nêzî 350 rojan di girtîgehên PDK'ê de ye û cezayê 3 salan girtîgeh lê hat birîn. Hevkariya PDK'ê bi dewleta Tirka a dagirker ve ji her kesî re eşkere bûye. Dagirkeriya Tirk li ser xaka Başûr bi 10'an baregeh avakirine. Rojane dagirkerî êrişî Herêmên Parastina Mediya dike, gundan wêran dike û sivîlan şehîd dixe. Dema ku Rojnemevan hewil didin van sûcên dagirkeriyê derxin, dibin armanca dewleta Tirk a dagirker. Herwiha dewleta Tirk bi hevkariya



Mizgîn Hesen

PDK'ê rojnamevanan dikin hedef, lê çiqas dagirkeriya Tirk hewil bide deng û rengê rastiyê veşêre, em ê wekî rojnamevan doza ku şehîdên me dane meşandin dewam bikin. Lê pirsa ku dikeve mejiyê mirov çima heta niha saziyên parastina mafê rojnemevanan bêdeng in. Ji despêka şoreşa Rojava û heta niha bi 10`rojnamevanên me şehîd bûne. Li Başûrê Kurdistanê gelek rojnamevan tên hedefgirtin û şehîd xistin, him tên girtin lê heya niha ti saziyeke navdewletî nerazîbûna xwe nîşan nedaye."

**Êrîşên li ser rojnamevanêpn jin**

Lîlav Hesen jî derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî rojnemevanan wiha got: "Ev ne cara yekem ku li Başûrê Kurdistanê bûyerek bi vî rengê çêdibe, beriya demekê bû ku careke din hevalên me li şengalê hatin hedefgirtin, hevalekî me yê rojnamevan gihaşt asta şehadetê, di 23'ê Tebaxa 2024`an de du rojnamevanên jin hatin hedefgirtina ji aliyê balafirê bê mirov em sersaxiyê ji malbata wan re dixwazin. Bêdemgiya hikumeta Herêma Kurdistanê û hikumeta Iraqê li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker û kiryarên PDK'ê derfetê dide wan ku sûcên li dijî mirovahiyê pêk bînin. Dewleta Tirk derfet ji xwer dîtiye ku li dijî rojnamevanan van êrîşên xerab pêk bîne, dema ku dewleta Tirk van êrîşan pêk tîne ji bo ku vê têkçûna xwe veşêre van êrîşa pêk tîne.Li gorî zagonên parastina mafê mirovan û parastina rojnemevanan hedefgirtina rojnemevanan sûcekî dimirovî ye, nabe ku tu kes tevgera rojnemevanan asteng bike. Lê saziyên navnetewî saziyên mafê mirovan bi vê bêdengiya xwe dibin hevkarên van êrîşan, bi taybet ji bo rojnamevanên kurd li Kurdistanê, rojnamevan rojane di nav êrîşan dene, pêwîste Hikûmeta îraqê û Başûrê Kurdistanê ji vê bênengiya xwe derkevin, ji ber ku îro êrîş li ser xaka wan pêk tên xaka Başûrê Kurdistan û Îraqê tê dagirkirin, em vê yekê qebûl nakin wê dewleta Tirk naghêje armanca xwe û dengê rastî û heqîqtê tu carî qut nabe."

## Ji Pênûsa Jin

### Ji bo jinê girîngiya xwe rêxistin kirinê

Nehîr Pale

Em ê bi nêrandineke gerdonî li pirsgirêk û têkoşîna jin binêrin. Nêrîna me li ser jin tenê di çarçoveya hişmendiya me de ye û têkildarî dîroka wê em tiştekî nizan in. Dibe ku tişta em li ser jinê dizanin tenê li gorî nêrandin û agahiyên zîhniyeta baviksalarî bin. Di encama wê de jin ji hevdû xerîbin, têkiliya wan bi hevre nîne û nizanin ku di civaka zayendperestî de wê çarenûsa wan mîna hev be. Bûyerên giran li ser asta kesayetan diqewimin lê nayê wateya ku em dikarin xwe biparêzin û bûyerên giran neyên serê me.

Eger jinek di bin navê namûs û şerefê de tê kuştin, ne dûre sibe yeke dîtir bi heman hincetê were qetilkirin. Di nava civakê de bûyerên balkêş diqewimin û mirov nikare wate bide van buyeran. Jineke hîna temenê wê 12 salî bû ji ber ku bi xortekî re dide û distîne bavê wê ew li pêşiya dayîk û birayê wê zindî şewitand. Ji xwe du rojan sax dimîne û wê nabin dektor heyanî ku dimre. Bûyereke wisa li ser civakê giran bû, her kesî bihîst û şoq derbas kiribûn. Lê belê bertek ji kesî derneket û bêdeng man.

Meclisa Kombûna Jin a Zenûbiya ev yek şermezar kir lê belê tenê bi vî rêbazî em ê nikarbin bibêjin ku wê dîse bûyerên wisa giran neqewim in. Dibe ku buyerên ji vê girantir biqewim in. Ji ber jin xwe birêxistin nakin û nikarin xwe biparêz in. Bav, bira û hevjîn ên ku jin pişta xwe dide wan, ji buyerên civakî diyar dibe ku ew dibin sedema kuştin, qetilkirin û tecawizkirina jinê.

Jin wê çawa xwe biparêz e? Xweparastin bi mijara me ve girêdayî ye, eger jin xwe birêxistin nekin gelo wê bikaribin xwe biparêz in? Dema ku mirov rewşa jinê dinirxîne û li şikestinên ku têre derbas bûye, vedigere, dibe di mejiyê me re derbas bibe ku gelekî zehmete jin li hevdû kom bibin û xwe birêxistin bikin. Ji bo jin bighîjin hevdû û xwe birêxistin bikin, pêdivî bi têkoşînê heye. Mêr ji aliyekî ve û zîhniyeta zayendperestî jî destûr nade ku jin li hevdû kom bibin û xwe birêxistin bikin. Mêr her tim jinan ji hevdû dûrdixîne, dikeve navbera wan de heyanî ku wan parçe û bê bandor dike. Destûr nadin ku jin bibin hêz û xwe birêxistin bikin. Rêxistinkirin, têkoşîn û perwerde kirin tê wateya ku dawî li zîhniyeta zayendperestî were. Li hemberî zîhniyeta zayendperest a mêr her tim berteka jin li ser asta kesan bû û ne komî bû. Di sedsala 19`emîn de jin destpê kiriye weke tevger xwe birêxistin dikin. Li Kurdistanê, Afxanistan, Îranê, Hindistan û gelek dewletên cîhanî jinê destpêkiriye xwe weke tevger birêxistin dike. Ji xwe tenê rêxistinkirin têrê nake. Xwe perwerde kirin, li ber xwe dayîn, têkoşîn kirin, xwe ava kirin û guhertin bi giştî hevdû temam dikin. Dema ku jin bikaribe ji hemû aliyan ve xwe birêxistin bikin, wê bikarbin xwe biparêzin. Rêxistin kirin bingehê xwe parastinê ye.



# Ji çiraxa huner û wêjeya kurdî



**Can Yûsif**

Evdil Ezîz Husên helbestvan û evîndarê welatê xwe ku tevî êş û derdan ji welat hezkir û jiyana xwe û her tiştê giranbuha jêre terxan kir.

Kurdistan li cem wî deriya dilsoziyê û cihê şahiyê bû, lewra wî helbestên herî bedew jê re nivîsand û bi tîpên zêrîn xweştirîn peyev jêre xêzkir û xweşiktirîn wêne li ser xwezaya wê ya rengîn û bedewiya wê ya balkêş nivîsand û wesyetkir li zarokên xwe ku ji welatê xwe hez bikin, berevaniya wê bikin û biparêzin.

Ji ber nêrîn û helwestên xwe yên wêrek hat girtin û avêtin zîndanê, lê wan hemûyan hêrs û îradeya wî neşikandin û evîn û hezkirina wî ya ji bo welatê wî kêm nekirin.

Helbestvanê Kurd Ebdulezîz Husên Hecî Mihemed (Ebdul Ezîzê Hiso) di 1/1/1920 'an de li gundê En Dîwarê ji du dê û bavên kurd (bav Husên û dayîk Eyşê) hatiye dinê, dibistana seretayî li dibistana En Dîwarê ya girêdayî bajarê Dêrikê xwendiye, ya ku dikeve li ser kenarê Çemê Dîcleyê li kêleka bajarê Cezîra Botan, keleha Memê Alan û Sitiya Zîn, ku Çiyayê Cûdî yê mirada bi hemû hezkirin û dilsozî hembêz dike.


Ebdulezîz Hisên bavê wî yek ji navdarên eşîrên Şikaka û Harûna yên herêmê bû, ew muxtarê gundê En Dîwarê bû, rehmetî Ebdulezîz Hisên li qeraxên çemê Dîcle û di nav sêlaka wê û di navbera geliyên En Dîwar û daristanên wê de mezin bûye.

En Dîwar wê demê navenda Şêwirmendiya (kunseliya ) Firinsî bû, li wê deverê tenê dibistana seretayî hebû, piştî ku Ebdulezîz qonaxa seretayî bi rengekî serkeftî qedand û bawernameya Sertifîka wergirt û ji ber nebûna dibistanên amadehî û lîseyê li herêma Dêrikê rehmetî Ebdulezîz neçar ma ku ji bo qedandina xwendina xwe ya amadehî derbasî bajarê Hesekê bibe û dibistana amadeyî jî bi dawî bike, lê çavê felekê birije nehişt ku xwendina xwe biqedîne sedema kîn û nefreta dagirkerên Firinsî li hember wê malbatê ji ber helwestên wan yên netewî û welatparêzî, di wê demê de desthilatdarên Firinsî fermana sirgûnkirina wê bavê wî bo bajarê Dêrezorê da, ji ber wê yekê wî xaka xwe û hezkiriyên xwe li şûn xwe hiştin, mala xwe terikande û dûrî cih û warê xwe û gelê xwe bû, li sirgûnê du salan jiyan kir bi tawana kuştina pênc leşkerên Firinsî li nav daristanên En Dîwarê di bin şert û mercên nepenî de.

Ji ber vê yekê rehmetî Ebdulezîz neçar ma dest ji xwendina xwe berde û li ser meseleyên malbatî mijûl bibe, rehmetî dildar û hijêkiriyê ilm û kulturê bû û bi çend zimanan (Kurdî, Erebî, Tirkî û Firinsî) baş dizanîbû, li her cihê ku pirtûkek û romanek bidîta wî dikiriya û li mala xwe pirtûkek çêkiribû û gelek pirtûkên çandî, wêjeyî û weke din jî têde hebûn.

Dagirkerên Firinsî tenê bi sirgûnkirina wê malbatê têr nebû, ew neçar kirin ku bi darê zorê wan ji En Dîwarê derbixin û jê dûrbikin, ji ber helwestên xwe yên niştimanperwerî û welatparêzî, wan ev yek wek metirsî li ser hebûna xwe li herêmê didît,ji lewra malbat neçar ma gundê xwe bêhêle û bi darê zorê koçî gundê Girasor yê ku dikeve li ser sînorên herêma Kurdistanê û li cem maqûlê eşîra Mîserşa (Heso Şelala) bibe mêvan, wî bi germî pêşwazî li wan kir, piştre rehmetî karîbû milkê gund ji wan bikire û bû xwedan û muxtarê gundê Girasor (Gira sorê Heso), wê demê wî daxwaz ji gelek malbatên eşîrên Şikaka û Harûna kir yên li gundewarên wan ku werin li wir bi cih bibin û niştecih bibin, wan mêvanxaneyek mezin li gund ava kirin ku hemû gundî tê de kom dibûn û rehmetî Ebdulezîz ji wan re çîrokên gelêrî yên kurdî û rûpelên ronakbîrî yên lehengiya gelê kurd ji wan re digotin, wek destana (Kelha Dimdim, Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn, Siyamend û Xecê...hwd.)

Ebdulezîz Hisên kesayetiyekî rêzdar yê netewî û civakî bû ku ji ber helwestên xwe yên mirovî, civakî û netewî ji aliyê xelkê gund û gundewarên cîran ve dihat hezkirin û mala xwe ji bo şoreşger, pêşmerge, siyasetmedar û Rewşenbîrên kurd, kiribû hêlîn û wargehek ewle, ji ber ku gundê wî li ser sînorê Iraq û Sûriyê bû. Dema ku di sala 1961'ê de li başûrê Kurdistanê bi serokatiya nemir Mistefa Barzanî şoreşa birûmet a Îlonê dest pê kir, agirê hezkirina ji bo welat, hezkirina Pêşmerge û şoreşa



Kurdistanê ya bi serokatiya Barzanî di dilê wî de geş bû û ew kire evîndarekî dilpak ji wan re. Dema ku dilê helbestvan di evîna welat de lêdide, hestek kûr diherikîne ser zimanan, helbestên şîrîn û bîhnxweş diafirîne, bi wateyên evîn û bêrîkirinê , têgînên şanazî û serbilindiyê û agirê heskirinê dihêle ku helbestvanê dilpakê welat ji xak, gel û rêbertiya wê re rêzgirtinê bigire.

Evdil Ezîz dizanîbû ku evîna ji bo welat ne tenê gotin, axaftin û helbest e, divê ev gotin di hemû qadên jiyanê de bibin kiryar, ji ber vê yekê jî bi wê hestê dilpak û giran li ser evîn û hezkirina xwe ya ji bo welat, Pêşmerge û serkirdayetiya Kurd re, di gelek sirûd û helbestên xwe de nivîsiye.

Ji ber vê yekê ew bû armanca rejîma Sûriyê, ji lewra ku 6 caran bi tometên curbicur wek piştgirî û hewandina Pêşmerge û şoreşgeran, alîkarîkirina tevgerên kurdî û sorkirina (hanedana) xelkê li dijî rejîmê hat girtin, 5 caran li zindana navendî ya Hesekê û carekî jî li zindana navendî ya Helebê sala 1966'an de bi serokatiya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê (Osman Sebrî û hevalên xwe re), van hemûyan ew ji hezkirin û evîna wî ya ji bo welatê wî bêhêvî nekir û baş dizanî ku evîna welat hesta wefadarî û dilsozî û girêdanê ye ku ji dil û fedekariya ji bo wê tê, dara azadiyê tenê di nav axa fedakariyê de şîn dibe û bi xwîn û xwêdan tê avdan, lewra wî hezkirina welat, fedekarî û rizgariyê di dilê zarokên xwe de ji bo azadkirina wê çandiye. Zarokên wî û yên birayên wî rêça wî şopandin û 2 ji zarokên wî (Dr. Kendal û Sozdar) û kurê birayê wî (Zinar) li çiyayên Kurdistanê tevlî karwanê şehîdên azadiyê bûn.

Abdulazîz Hisên di roja 29/12/1978'an de bi sedema kirîza dil koça dawî kir.

Abdulazîz gelek helbest û sirûd bi şêweya kilasîk (bi kît, rêzbend û pêlawaz) li ser Kurdistanê, li ser azadî, şoreş û Pêşmerge, li ser evîn, aştî û hezkirinê û li ser berxwedana zindanan, derd û belayan û qederê nivîsandiye.

Lê mixabin ji ber rewşa siyasî û zextên rejîmên Sûriyê yên li pey hev li ser welatparêzên Kurd di wê demê de, gelek ji wan di wê heyamê de zerer û ziyan dîtin û wendabûn, di van demên dawî de kurê wî Mihemed bavê Fener bi saya keda xwe, ji tirsa windabûn, jibîrkirin û ziyangirtinê karîbû çend sirûd û helbestên wî berhev bike û biparêze di dîwaneke helbestên bi zimanê kurdî de bi navê "Ey Felek",tê de bîst û heft helbestên curbecur ên li ser rûmeta welat, Serok Barzanî, Pêşmerge, hezkirin û evîn, yekîtî û aşitiyê hene. Hezar rehmet û rûmet li giyanê wî yê pak be û ji bo mîrasa wî ya têkoşînî, çandî û wêjeyî mayende û berdewamî.

## Têbînî

### Serdema têkçûna kovarên çandî



Kemal Necim

Kovarên wêjeyî yên çandî stûneke girîng a çandê ne. Bi rêya kovaran, wêje, afirîneriya nivîskî, rexne, nûçe, mijarên çandî, karên hunerî û şêwazên din ên zanînê û bedewiyê ji bo civakê têne guheztin. Her tiştên ku pêşengên wêje û çandê li şûna xwe hiştin di pirtûkên kaxez û kovarên çandî de hate parastin.

Kovarên çandî çi ne? Ew weşanên ku di bin sernavek diyarkirî de têne derxistin û heftane, mehane an sê mehane têne weşandin in. Du celebên kovarên çandî hene:

Kovarên çandî yên giştî, ku guh didin hemû cureyên çandê, mîna zanistî, huner, civak, aborî, siyaset û hwd.

Celebê din kovarên çandî yên pispor in, mîna kovarên wêjeyî, ku tenê li ser wêjeyê ye, yan jî bi cureyeke wêjeyê ve mijûl dibin, mîna helbest, çîrok, yan herdu bi hev re, yan jî rexneya wêjeyî, her wiha kovarên hunerî, yên ku bi hunerê yan jî çend şaxên hunerê re mijûl dibin, wek sînema, şano, televizyon, hunerên bedew, û kovarên zanistî, yên ku di warê zanistî de pispor in, wek bijîşkî, çandinî, zanistiya asmanê û wekî din.

Bê guman kovar xwedî roleke sereke û pêşeng in di pêşxistina hişmendiya çandî, rexneyî û ronakbîrî de, her wiha avakirin û teşekirina ekolên curbicur ên wejeyî, rexneyî, çandî û rewşenbîrî de, û çesipandina nirxên çandî û bedewiyê û belavkirina efrandinên wêjeyî yên afrêner û daner û nivîskaran.

Bi rêya kovaran zanyarî û agahdariyên nû û kêrhatî bi awayekî rêkûpêk belav dibin. Ev jî dibe alîkar ku asta perwerdehî û hişmendiya di nava kes û civakan de zêde bibe.

Kovar çand û hunerê pêş dixin, ji ber bi rêya kovaran gelek mijarên girêdayî çand û hunerê, wek wêje, sînema, muzîk, dîlan û hunerên bedew têne weşandin. Ji ber vê yekê, kovar çand û hunerê pêş dixin û dibin alîkarê xurtkirina diyaloga çandî û danûstendina çandî di navbera çandên cihê de.

Kovar dikarin bibin cihê derbirîn û danûstendinê, û rê didin kesan ku raman, nêrîn, û serpêhatiyên kesane vebêjin û derbirînin. Kovar di navbera nivîskar, xwendevan û bi giştî civakê de wek platformeke têkilî û danûstendinê ye.

Eger em li gorî girîngiya kovaran li rewşa kovargeriya li Rojava binerin, em ê bibînin ku qelsî û kêmasiyeke pir mezin heye, ku mirov dikare bêje serdema têkçûna kovarên çanî ye.

Ji dema qedexeya li ser çand û weşangeriya Kurdî heta niha li Rojava pir kovar derketine, piraniya wan kovaran yan bi alîkarî û piştfiriya partiyên siyasî bûn yan jî xebateke dildarî ya çend rewşenbîr û nivîskaran bû. Lê yek ji wan kovaran nebû kovara civaka rewşenbîrî her wiha yek ji wan jî berdewam nekir. Piştî salên şoreşê, dîse gelek kovar derketin, beşekî mezin ji wan di bin siya saziyên çandî yên rêveberiya xweser de derdikevin, beşek jî bi rêya hin hewildanên kesane yan bi piştgiriya hin rêxistinan. Lê dîse jî mirov nikare behsa kovareke civakî rewşenbîrî pêbawer bike. Ji ber pir sedeman. Yek jê kêmbûna kesên pisopr ku van kovaran birêve bibin. Ev dihêle ku naveroka kovaran qels û kêm be. Sedemeke din jî ku xwediyê kovaran, çi kes, çi sazî, beramberî nivîsan alîkariya diravî bi nivîskaran re nakin, lewma nivîskar xwe nawestîne ku berhemeke binirix biafirîne.

Ji ber kêmbûna piştgiriya darayî, piraniya kovaran piştî çend hijmaran radiwestin û careke din nayên weşandin. Pir girîng e ku aliyên têkildar, bi taybet desteyên çandê, piştgiriya kar û xebatên kovarvaniyê bikin. Rê bidin ku kovarên wêjeyî û zanistî yên pispor pêş bikevin û bibin platformên belavkirina zanist, raman, wêje û bedewiyê.

# ‘Çandina daran bingeha domandina jiyanê ye’

## Jina ciwan a bi navê Cûdî Ibrahîm ku insyatîfeke kesayetî ya çandina daran li bajarê Qamişlo daye destpêkirin diyar kir ku hevkariya civakî bingeha serkeftina tevahî insyatîfan e.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi sedema şer û pêvçûnên domdar, di piraniya warên jiyanê de gelek kêmanî derket mîna qûtkirina av û elktrîkê, gel jî neçar ma ku alternatîfên cuda bide bikaranîn. Ev altirnatîv jî bûye sedema qirêjkirina hewa û jîngehê bi giştî. Di heman demê de ziyaneke mezin li tendirustiya mirovan dike. Li hemberî wê jî, da ku hewaya herêmê û jîngeh bi giştî paqij bibe, gelek pêngavên cûda tên li dar xistin. Yek ji van pêngavan ku bandoriyekê erênî li jîngehê de, pêngavên çandina daran e.

**Armanc projeyên çandiniyê:**

Hebûna daran li bajar û gundan dihêle ku hewa ji gazên jehrî paqij bibe, ji bilî wê vegirtina CO2 ji bo kêmkirina guhertina avhewayê, herwiha ji bo parastina bejahiyê û



tenduristiya mirovan ji nexweşiyên respirasyonê kêm bike, wekî din aboriya herêmê pêşdixe û dihêle xwe têr kirin çêbibe.

Li bajarê Qamişlo jineke ciwan bi navê Cûdî Ibrahîm bi slogana “Dar pişika bajêr e” insyatîfeke kesayetî ya çandina daran da destpêkirin, armanca wê jî parastina xwazyê û zêdekirina hişyarkirina civakî ye.

Derbarê mekenîzmeya inseyatîfa çandina daran û armancên wê, jina ciwan ya ji bajarê Qamişlo ku insyatîf daye destpêkirin ji Rojnameya me re axivî.

Cûdî Ibrahîm di destpêka axaftina xwe de wiha got: “ Tîma me ya hemleyê ji 101 kesan pêk tê, ji wan 11 endezyar û 4 pisporin. Hemleya çandiniyê wê li ser asta kantona Cizîrê bi giştî be li bajar û gundan. Di riya komînan wê dar bên belav kirin û ji aliyê xwe ve wê daran bişopînin û biparêzin. Lîsteyek me amadekiriye nêzî 2000 kes tevlî hemleyê bûne, gelek kampanî, endezyar, bijîşk û hinek dikanên bazirganiyê wê alîkariyê bidin me û tevlî hemleyê bibin, çi di riya pêşkêşkirina alîkariya madî an pêşkêşkirina daran û çawaniya çandina daran.”

Cûdî Ibrahîm wiha pê de çû: “Me sardana Desteya Ekolojîk kir ji bo alîkariya me bike ji ber ku ew piştgiriya hemleyên dilsoziyê yên civakî dikin wekî din wê hejmareke baş ji daran pêşkêşî me bike. Tîma wan ya çandiniyê jî heye wê bi mere bibe akîlar ji bo çandinê, zêdetir gundên ku hewcdarî daran e nas dikin. Wekî din me danûstendin bi xwediyên meştelan kir ji bo peydakirina cureyên daran; darên berdar wê li gundan bên çandin ji bo pêşketina aborî û xwe têrkirin zêde bibe, êdî nema hewce hebe em sebze û fêkî ji derve bînin.”

Cûdî Ibrahîm wiha domand: “Hemleya çandina daran di 15`ê meha Îlonê de ji bajarê Qamişlo wê destpê bike û ber bi Amûdê, Dirbêsiyê û Hesekê ve biçe. Bi rastî pêdiviya şînkayê li derdora me pir heye, ji ber ku jenertorên elktrîkê pir bûne nemaze kargeha û kargehên neftê û gazê ku bandoreke neyinî ser jiyana mirovan dike gelek nexweşiyan bi xwe re tîne mîna nexweşiya Rebû û Qnsêrê di riya zêdebûna mesaheta şînkayê em karibin nexweşiyan kêm bikin, hewayeke paqij peyda bikin û em bibin parçeyek ji desteya ekolojîk û alîkariya wê bikin di vî warî de.”

Cûdî Ibrahîm diyar ew ê semîneran jî bidin di riya komînan têkildarî armancên hemleya darçandinê herwiha belavkirina broşorên hişyarkirina civakî derbarê parastina bejahiyê, me çend semîner jî dane çend taxan û em ê berdewam bikin vê yekê û got: “Em dixwazin çandina daran bibe çandek di nava civakê de belav bibe. Em ê di hemleyê de zarokan jî tevlî bikin ji bo ji zaroktî li cem wan ev çand çêbibe û çawa parastina daran û derdora xwe bikin”.

Cûdî Ibrahîm wiha gotinên xwe bi dawî kir: “ Hêviya min ku hemû civak tevlî vê hemleyê bibin ji ber ku alîkariya civakî bingeha serkeftina hemleyan e û insyatîf bidestxistina çandê ye. Ji bo parastina nifşên bê ji nexweşiya em daran biçînin û cihên şînkayê mezin bikin, ji ber ku darçandin bingeha domandina jiyanê ye û dibe alîkar ji bo guhertina avhawaya me ber bi baçûbûnê”.

Darên ku bên çandin ev in: (Zeytûn, Hinar, Tû, Tirî û Fisteq Helebî û Kestena,Leymûn û Xurme) li gundan bê çandin, li bajar wê yên( Şemsî, Hinar, Tirî û Leymûn) bên çandin.

# Ji hezkirina siwarbûna hespê ber bi dayîna perwerdeya wê ve

**Navenda Nûçeyan**

**Jina ciwan Meryem Elî diyar kir ku siwarbûna hespê yek ji awayên dermankirina gelek nexweşiyên derûnî ye, di nav wan de nexweşiya Otîzimê, herwiha ew di pêşvebirina tendirustiya giyanî û derûnî de rolek baş dilîze.**

Li Çandîngeheke nêzî bajarê Qamişlo, jina ciwan ya bi navê Meryem Elî ku temenê wê 26`salî ye, bi malbata xwe re hespan xwedî dike, herwiha fêrbûna siwarbûna hespan jî dide.

**Jiyana Meryem Elî**



Meryem Elî bal kişand li ser eşqa xwe ya ji bû siwarbûna hespan û wiha got: “Di sala 2021`an de ez fêrî siwarbûna hespê bûm, despêka wê tirsa min gelekî jê hebû ku ez nêzî siwarbûna hespê bibim tevî ku xeyalên min yên kevin bû jî, lê gelekan piştgiriya min kir ku ez bighêjim armanca xwe, min sînorê tirsê derbas kir û hezkirina min ji hespê re çêbû, niha ez zarok û jinan û xûrtan fêrî siwarbûna hespê dikim, kursên fêrbûnê ji 15`rojan heta mehekê dirêj dike. Her kesayetek li gorî zîrekbûna xwe dema fêrbûnê diyar dibe.”

**Kar û xebatên Meryem Elî**

Meryem Elî di setên sibehê de li yek ji nexweşxaneyên Qamişlo kar dike û piştî nîvro jî serperiştiya perwerdekirina komek zarokên ji 6 salî û jûr de fêrî siwarbûna hespan dike. Sedema hilbijartina siwarbûna hespan, ew e ku hesp dibistaneke ku mirov jê fêrî nirxên hêja yên wekî xwebawerî, hêz,

Meryem Elî ji me re behsa qonax û gavên perwerdehiyê kir

Meryem Elî ji me re behsa qonax û gavên perwerdehiyê kir û axaftina xwe wiha qedand: “Destpêkê di navbera kesê fêr dibe û hespê de têkiliyek çêdibe, ew têkilî ji axaftina bi hespê re dest pê dike bêyî ku lê siwar bibe, piştî wê li hespê siwar dibe, piştî ku xwe bi hespê dide naskirin û hespê dimeşîne, bi tena serê xwe diqede. Jêhatîbûn di heyamekê de bi qasî 20 rojan tê texmîn kirin. Di warê fêrbûna siwarbûna hespê de ferqek di navbera zarok û mezinan de heye, li gorî wê zarokê ji mezinan zûtir hîn dibin, wêrektir in û çalaktir in.”

# Gul û Gulîstana Me!



**Sînan Cûdî**

Qencî baş e.

Her roj qencî û başiyek kirin girîng e.

Çima?

Ji ber ku giredan û îcabîyet û hestê civakbûnê teşwiq dike. Kenegî, gotinekî nazik ango destê alîkariyê dirêjkirin dikare roja yekî/ê ronî bike. Ji wan re dibêje “ez te dibînim”, “nirx didim te”.

Ev keliyên xweşî û nirx dayînê wekê pêlan di nava mirovên din de jî belav dibe û civakê bi awayekî komî radike.

Wekî hûnermendekî hesas û bi xweşbinî nêzî jîyanê bûn, bêguman heskirinekî mezin di dil de dixwaze. Heskirinê her tiştî û kesî ne karê her kesî ye. Bi taybet cihanê ku bi tijî reşbinî û ezezitî de bi hêza dil û heskirinê têkoşan ne karekî hesan e.

Îca cihanê ku te tim sucdar dike û ji bo tûnekirinê te tim li pêy te be, sedemên heskirinê peydakirin de zehmetî dikşîne mirov. Ji xwe tu jin be ev zehmetî bi dehan qet zêdetir dibe.

Her kelî û roja Gula me bi van pênaseyên jorîn ve eleqedar bû.

Nazik bû, berpirs bû, hûnermendekî jiyana azad bû; her bi xweşbinî û wêrekîyê dijî.

Ne tenê ev bûn bêguman.

Kedkarekî ragihandina azad û rêhevala bi hezaran şoreşgeran bû.

Bi fikir û bawerîyê xwe di sazkirina çanda azadîya gelan de xwedî parekî mezin bû.

Di êrîşekî dewletê dagirker a tirk 23yê tebaxê gihiştî şehadete. Findê wê di bêdawîtî de şewq dide êdî. Bedewbûna wê êdî bêdawî ye. Ger wekê Gulê erênî binirxînin, ev çûyin dibê sedemê hebûn û hatinên nûtir û xurttir.

Bi gelek awayan dikarin behsa Gulê bikin û emê hîn gelek jî bikin. Di nava şopdar û kedkarên ragihandina azad de rola ku Gulê listîyê wê bibê mijarên dersan. Ji bo her hevalekî me yê ragihandina azad de kar dike kesayeta Gulê bibê mînak û em her bixwazin Gulê di nava xebat û têkoşîna xwe de bidin jiyîn.

Wek Gul bûn, wek Gulê bûn. Bi ya min navê dersên me jî divê bi vî sernavî be.

Rêber Apo nezarîya Gul ji bo danasîna fikra parastina cewherî pêşxistibû. Her zindîyê heyî ji bo xwe ji êrîşên derve biparêze divê nîzamekî xwe ya parastinê saz bike. Û strîyên gul jî wekê vî sîstemê parastinê bi nav dikir. Ji xwe dema sala 1999’an de pêşnîyar kir ku gerîla ji bakurê kurdistanê paş ve bikişe bi vê navê roj/cejnekî jî pêşnîyar kiribû. Lewma 2yê tebaxê wekê “roja gul” hat îlan kirin.

Çima wilo bû? Me êdî paradigma guhartiba û di vê guhartinê de yek jê rola herî girîng diket li ser feraset û pratîka parastinê. Lewma me Parastina Rewa wekê rêbazê têkoşîna paradigmayê nû hilbijart. Yanî nezarîya Gul û parastina rewa bi hevûdu re ev pêşeroja ku di nav de ne ji me re afirand.

Me dev ji arteş û nîzamên zilam û dewletan berda û nîzamekî parastinê ya ku rengê jinê di nav de xurttir e ava kir.

Gulistana me jî di nava vê pêşketinê de, wekê nezarîya gul û bi vî sîstema parastinê nû mezin bû. Lewma her roj û kelî bi xweşikî û nazenîniya ruhê xwe tevlî bû. Jîyan xweşik kir Gulê. Wek gul bêhnek xweş da dor. Çawa ku bi dîtina gulekî û bêhnkirinek gul roja me xweş dibû, bi Gula me her roj û kelîyê me xweşiktir û manetir dibû.

Wek seydayê cegerxwîn gotî, em ji xew dirabûn û me gulfiroşek didît. Me Gulê didît. Û em gelek şa dibûn. Gul bi dil didî.

Gotinê min têre nake ji bo Gula me. Dê bila seyda berdewam bike li ser navê me jî.

Hebû me yek dil, tev jan û kul bû;
Nebûme bawer, gul bi dil bidî, gul bi dil bidî
Bazar me kir go “Ser bi ser nadim;
Ê gulperest bî, can û dil didî, can û dil didî”



# Rewşek wisa di lîteratura cîhanê de tune ye

## Parêzerê Rêber Abdullah Ocalan Omer Guneş, anî ziman ku nêta Tirkiye tune ku di mafê hêviyê de gavan bavêje û got: “Mînaka rewşa Abdullah Ocalan li cîhanê tune ye. Êdî bi gotinê jî nayê pênasekirin.”

**Navenda Nûçeyan**

Yek ji parêzerên Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan Omer Guneş, li ser biryara Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropa (DMME) ku di 2014’an de ji bo Rêber Abdullah Ocalan dabû axivî û wiha got: “DMME’yê 10 sal berê ji bo mafê hêviyê bê parastin biryar dabû. Ez di wê baweriyê de me ku Tirkiye der barê serbestberdana Abdullah Ocalan a ji bo mafê hêviyê de tu gavan navêje. Dema em li şert û mercên heyî dinêrin û helwesta Tirkiyeyê ya neçareserkirina pirsgirêka kurd dinêrin; em digihêjin wê baweriyê ku Tirkiye tu gavan navêje. Rewşa ku Abdullah Ocalan tê de ye rewşeke mînaka wê tune ye. Êdî gotina Rewşa Awarte jî têra pênaseya şertên ku Abdullah Ocalan tê de ye nake. Rewşek pir taybet û xwemalî ye. Rewşek wisa di lîteraturê cîhanê de tune ye.”

**Tirkiye ji xweber gavan navêje**

Parêzer Omer Guneş, da zanîn ku di cîhana moderin de nehatiye dîtin ku rêberekî 13 salan bi parêzerên xwe re hevdîtin neke û wiha pêde çû: “Bi taybetî 9 sal in di bin tecrîdeke mutlaq de ye. Heta niha tecrîdek wisa mutlaq û ew qas giran li ser tu rêberekî nehatiye meşandin. Ji ber vê yekê gotina binpêkirina mafan êdî têrê nake. Tirkiye girêdayî peyman û saziyên navdewletî ye. Li vir a girîng rol û bandora saziyên navdewletî ya li ser Tirkiyeyê ye. Heta ku Konseya Ewropa (KE) Saziya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) û hwd, rola xwe nelîzin Tirkiye gavan navêje. Her wiha rewşa girava Îmraliyê jî nayê guhertin. Hêza Tirkiyeyê ya navxweyî têrê nake hin guhertinan bikin. Xwestekek Tirkiyeyê ya guhertinê jî tune ye. Heta ku hêzên derve li ser Tirkiyeyê ferz neke, Tirkiye bi xwe guhertinan pêk nayîne. Heta ku hêzên derve zextan li Tirkiyeyê neke, Tirkiye tecrîda li ser Abdullah Ocalan ranake. An jî divê tevgera kurd bi awayekî serkeftî gavan bavêje ku guhertinan pêk bîne.”

**Gelek gav hatin avêtin**

Parêzer Omer Guneş, bal kişand ser xebatên dîplomasiyê yên ji bo çareseriya pirsgirêkên kurd jî û ev agahî dan: “Di aliyê dîplomasiyê heta niha têr neke jî gelek gav hatine avêtin. Ev xebat bi hin kesayetên demokrat ên navdar re hatin kirin, kesên navdar ên wekî akademisyen, nivîskar, rewşenbîr û siyasetmedar re, him jî bi saziyên sivîl re xebat hatin kirin. Dîsa di qada navdewletî bi taybetî li Ewropayê bi delegasyon û rayedarên dewletê re hin hevdîtin hatin kirin. Ev xebat heta astekê digihêje pêlek girîng. Ji bo dîplomasiyê derfet û sazî jî hene.”

**Encam girêdayî têkoşînê ye**

Omer Guneş, li ser encamên xebatên dîplomasiyê jî rawestiya û wiha got: “Beriya her tiştî armanca van xebatana fikrek û hestiyariyekê ji bo azadiya Abdullah Ocalan bidin çêkirin pêş dikeve. Bala şexsiyetan, saziyan û dewletan dikişine ku gelê kurd ji bo azadiya Abdullah Ocalan dixebitin.



Wekî Nelson Mandêlla, azadiya Abdullah Ocalan jî ji bo gelê kurd mijarek jiyanî û gelekî girîng e. Kurd çiqas serkeftî têbikoşin dê encam jî ew qas xurt bi dest bixin. Dema gelê kurd bandorekê li ser hêzên derve bike û ev hêzên derve erka xwe pêk bînin, dê wekî Nelson Mandella, encamê bigire û dê ev hêz bandorek mezin li ser Tirkiyeyê bikin.”

**Eleqeya pirtûkên Abdullah Ocalan zêde ye**

Guneş, bal kişand ser xebata xwendina fikr û pirtûkên Abdullah Ocalan û wiha lê zêde kir: “Ev xebata xwendina pirtûkên Abdullah Ocalan eleqeyek baş dibîne. Xebatên ji bo azadiya Abdullah Ocalan hem di asta kesayet û saziyan de û hem jî di asta rêxistinan de eleqeyek mezin dibîne. Belavkirina van fikran gelek girîng e. Eleqeya vê xebatê baş e, lê pêwîste mirov hinek din berfirehtir bike.”

**Helwesta CPT siyasî ye**

Parêzer Omer Guneş li ser rola CPT jî rawestiya û wiha got: “CPT her çendî der barê Abdullah Ocalan de raporan amade bike û her çend rewşê rast û fireh tespît bike jî, gav avêtina Tirkiyeyê rasterast girêdayî Konseya Ewropayê ye. CPT heta astekê dikare tiştekî bike. Bêdengiya CPT û KE’yê rasterast girêdayî rewşa siyasî ye. Mixabin heta bûyer û geşedanên siyasî li gorî lehê kurdan pêş nekeve û hin geşedan di lehê kurdan de neye şîrovekirin, dê ev bêdengiya CPT berdewam bike. Di navbera peywira saziyê û bêdengiya wan de nakokiyên mezin hene. Avakirina wê û xebatên wê hiqûqî ye. Pêwîste CPT di hiqûqê de israr bike û qedera bêhiqûqiyan, ji holêrakirina bêhiqûqiyan divê girêdayî biryarek siyasî nebe. Qedera CPT a girêdayî biryara siyasî nakokî û bêçaretî ye. Tevgera CPT a heyî, bi temamî siyasî ye. Bêdengiya CPT siyasî ye. Pêwîste li gel xebatên hiqûqî, xebatên siyasî jî bên kirin. Xebatên siyasî divê di astek mezin de bi taybetî di Konseya Ewropayê de bên kirin ku bandorê li ser CPT bike. Divê CPT di eleqê Tirkiyeyê de qanala daxuyaniyê veke. Mafê CPT heye ku der barê Tirkiyeyê de daxuyaniyekê bide. Wê demê Tirkiye mecbûre daxuyaniyê bide û gavekê bavêje.”

**Bêtir pêdivî bi xebatên siyasî hene**

Parêzer Omer Guneş, li ser xebatên azadiya fizîkî ya Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan jî rawestiya û wiha bi dawî kir:“Ji bo azadiya fizîkî di aliyê hiqûqî û siyasî de xebatek tê kirin. Lê Pêwîste xebatên siyasî derkevin pêş. Ji ber ku Tirkiye dibêje dê heta dawî di girtîgihê de bimîne. Lê li gorî biryara DMME’yê jî divê Abdullah Ocalan bê berdan. Ev nakokî bi biryarên siyasî ji holê radibe. Di aliyê hiqûqî de têra xwe gelek doz û dosya li DMME’yê hene. Dê ji niha û şûnde jî dosya bên zêdekirin û doz bêne vekirin. Di aliyê hiqûqî de têra xwe xebat tê kirin. Ji bo azadiya Abdullah Ocalan geleke xebatên siyasî di asta bilind û asta navdewletî de pir berfireh bêne kirin. Di 10’ê Cotmeha 2023’yan de xebatek ji aliyê dostên kurdan ve hat destpêkirin. Ev xebat gelek girîng e. Mirov dikare bişibîne rewşa birêz Mandella. Lê divê ev xebat hîn berfirehtir û mezintir bibe. Xebatên siyasî bêtir giring û bandorker in.”

# ‘Hêza çareseriya aloziya Sûriyê pergala Neteweya Demokratîk e’

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Hevseroka Meclisa Diblomasî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nûrşan Hisên diyar kir ku di komxebata PYD`ê de gelek nîqaş û pêşinyarên girîng ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê û hebûna nasnameya kurdî li Sûriyê, li ser du rûniştinan hat kirin û got, “Rêveberiya Xweser çareseriya bingehîn ya çareserkirina aloziya Sûriyê ye.”**

Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê bi diruşmeya ‘Pênasekirina Nasnameya Kurdî Û Gelên Sûriyê Di Pergala Neteweya Demokratîk de’ têkldarî doz, çand û hebûna gelê kurd li Sûriyê di 21`ê Tebaxê de komxebatek li dar xistibû. Di komxebatê de, hin partiyên kurdî, siyasetmetar, rewşenbîrên kurd û hin kesayetên din li ser asta kantona Cizîrê beşdar bibûn. Armanca komxebatê jî ew bû ku pênasekirina nasnameya kurdî û tevahiya pêkhateyên Sûriyê hem jî felsefeya Neteweya Demokratîk bêrî şoreşê û piştî bê zelalkirin û nirxandin. Herwiha komxebat li ser du mijarên sereke hatibû nîqaşkirin, yek jê pêşveçûna sosyolojiya çandî û siyasî ya nasnameya kurdî, berî û piştî Şoreşa Rojava, mijara din nasnameya kurd a siyasî û rêxistbûyî ya ku piştî şoreşê ava bûye û perspektîfa çareseriya doza kurdî li Sûriyê.

Derbarê encamên komxebatê de Hevseroka Meclisa Diblomasî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Nûrşan Hisên ji rojnameya me re axivî.

Nûrşan Hisên diyar kir ku di 21`ê vê mehê de ji aliyê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê ve Komxebatek hatibû birêxistinkirin û wiha got: “Komxebat bingehê wê li ser du runiştinan hat birêvebirin, yek li ser pêşketina yan jî pêşveçûna sosyolojîk, çandî û siyasiya nasnameya kurdî li Sûriyê berî û piştî şoreşa Rojava, rûniştina duyemîn jî pênasekirina nasnameya kurdî ya siyasî û rêxistinbûyî ya piştî şoreşa Rojava hatiye avakirin, ev jî bi beşdarbûna nêzî 80`ê kesî/ê ji rewşenbîr, kesayetên di zanîngeha Rojava de, mamosteyên dibistanan û Rêveberiyên Saziyan pêk hat. Herwiha nîqaş li ser nasnameya kurdî li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê de hat kirin. Ji ber ku niha em di pêvajoyekî gelekî girîng û hestiyar re derbas dibin. Bi rengekî domdar êrişên qirkirinê li her çar perçeyên Kurdistanê li ser gelê kurd heye û li Sûriyê bi tevahî gefên dewleta Tirk li ser nasnameya kurdî ya ku pergala Neteweya Demokratîk birêve dibin heye. “

**‘Misogeriya hêza çareseriya aloziya Sûriyê pergala Neteweya Demokratîk e’**

Nûrşan Hisên di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku em ê çawa rolekî pêşeng di hundirê aloziya Sûriyê de bilîzin û wiha got: “Ya girîng ew e ku em ê çawa bihêlin nasnameya kurdî cihê xwe li Sûriyê bigire û rolekî pêşeng di hundir aloziya Sûriyê de bilîze, herwiha çawa bihêlin hêza çareseriyê di bin sîstema pergala netewa demokratîk de pêk bê, nîqaş bi vî rengî hatibûn kirin. Û gelek nirxandinên pêşveçûna dîrokî ya hebûna kurd li Sûriyê hatin kirin. Di heman demê de çawa doza kurdî di Sûriyê de bê çareserkirin, weke doza kilît ji bo hemû pirsgirêkên ku di aloziya Sûriyê de derketina pêş hatin nirxandin û çareseriya doza kurdî li Sûriyê weke kilîta çareseriyên nasnameyan ku di Sûriya pêşerojê ya Sûriyeke demokratîk ne navendî û pir alî hat nirxandin. Herwiha hinek perspektîvên ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê û pêşinyarên ku kurdan li Sûriyê pêş xistine hatin nîqaşkirin. Rûniştina yekemîn a komxebatê ji aliyê Mamoste Sîpan Ismayîl û rûniştina duyemîn jî aliyê Ilham Ehmed ve weke axêver hatin kirin, bi vî awayî nîqaş hatin birêvebirin.”

**‘Sûriyeyek ne navendî pir alî bê avakirin’**

Hevseroka Meclisa Diblomasî Nûrşan Hisên axaftina xwe wiha qedand: “Di komxebatê de nîqaşên ku hatin kirin piraniya xwe ku çawa aloziya Sûriyê bê çareserkirin di bin pergala netewa



demokratîk û Rêveberiya Xweser de. Rêveberiya Xweser çareseriya bingehîn ya çareserkirina aloziya Sûriyê ye, ji bo wê em sîstemekî konfedral ava bikin ku mafê hemû pêkhateyên di herêmê de bê parastin û li ser bingehê demokratîzekirina Sûriyeke ne navendî piralî û demokratîk bê avakirin. Herwiha perçeyên ku niha Sûriyê bi wan rûbirûye û mîna sê erdnîgariyan jiyan dike, erdnîgariya Rêveberiya Xweser, erdnîgariya bin kontirola Hikumeta Şamê û erdnîgariya ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ye, bi rengekî demokrat û xweser bê yekirin.”

# ‘Yê ku tê darizandin ne Silêman Ehmed e, pênûs û dengê rastiyê ye’

**Rojnamevan Zinar Yildiz da xuyakirin ku di demên dawiyê de li Başûrê Kurdistanê zext û zordarî hatiye zêdekirin, ji bo dengê rastiyê dernekeve holê.**

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Di 25’ê Cotmehê a 2023’an, edîtorê ajansa Rojnewsê ya beşa Erebî, Silêman Ehmed ev 5 sal bû ku bi fermî ji Başûrê Kurdistanê derbasî Rojavayê Kurdistanê dibû, ji deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) yê di bin kontrola çekdarên PDK’ê de ye, dema ji bo serlidana malbata xwe ya li Taxa Şêxmeqsûd a Helebê bike, di aliyên çekdarên PDK’ê ve hat girtin. Bi awayekî fermî dihat diçû, ji aliyê hêzên PDK’ê ve bi hinceta tevlî çalakiyan bûye û endamê PYD ( Partiya Yêkitiya Demokrat) hat girtin û hat darizandin. Di encamê de cezayê 3 salan girtîgehê li rojnamevan Silêman Ehmed hat birîn. Derbarê girtina rojnamevan Silêman Ehmed de, hempişeyê wi rojnamevan Zinar Yildiz ji rojnameya me re axivî.

**‘Bi awayekî fermî hevalê me derbasi Başûrê Kurdistanê dibû’**

Rojnamevan Zinar Yildiz da xuyakirin ku ev biryara girtigehê derheqê Silêman Ehmed de hatiye birîn,



siyasî ye û wiha dest bi axivtina xwe kir: “Di serî de dema mirov nêzikatiyên desthilat û metingeran binirxîne, rê nade ragihandin û sazîyên çapemenîyê ji bona bikarin heqiqetê derxinin holê. Taybet li Başûrê Kurdistanê herêmên di bin desthilatîya PDK’ê de piştî dîroka 2003’an têkbirina rejîma Sedam Hûsên, PDK‘ê bû desthiladar. Ev ji di aliyê neyênî de pir guhertin bi xwe re anîn. Pir kiryarên derqanûnî li hemberî çapemenî û ragihandina azad pêk anîn. Di bin desthilatiya PDK’ê de gelek rojnemevan hatin qetilkirin. Bi şêwazekî wisa ev dikirin ku kujerên wan ne diyar bin. Pir rojnamevan hatin girtin, cezayên bi salan yê girtîgehê li wan hat birin û dest danîn li ser alavên wan yên ragihandin ê. Di wî alî de dema mirov siyaseta PDK’ê dinirxîne, taybet li hemberî rojnamevan û endamên çapemeniya azad dîrokekê reş e. Destûr nadin ku dezgeh û saziyên çapemeniya azad bi şêwazekî fermî kar û xebatên xwe li Başûrê Kurdistanê bimeşînin. Rojnamevan Silêman Ehmed jî endamekî fermî yê ragihandinê bû. Di ajansa Rojnews ya beşa zimanê Erebî de kar dikir. Hatin çûyina xwe ya li Başûrê Kurdistanê fermî bû. Rûxmê ku bi dehan caran deriyê Sêmalka (Pêşxabûr) hatibû li Rojavayê Kurdistanê jî, ji bona hevdîtina malbata xwe ya li Taxa Şêxmeqsûd ya Helebê. Silêman ji parêzerê xwe re dibêje, dema tê desteserkirin di aliye çekdarên PDK’ê ve demildest lêpirsîna wî di aliyê endamên MÎT‘a Tirk ve tê kirin. Pirsên ku lê dipirsin û kesên lê pirsîna wî dikin hemû saziya istixbarata Tirk ya MÎT‘ê ye. Ev revandina Silêman Ehmed bi hevkariya PDK’ê û MÎT a Tirkan hatiye kirin.”

**‘Mafên wî yên xwe parastinê destê wî hatine girtin’**

Zinar Yildiz wisa berdewam kir: “Mafên Silêman Ehmed yên xwezayî yê parastinê ji destê wî hatine girtin. Demekê dirêj agahî ji malbatê re jî nehatiye dayîn. Parêzer nedikarin biçin hevdîtinê bi Silêman Ehmed re pêk bînin. Heya Demekê ji raya giştî jî, di derheqê rewşa Silêman Ehmed de ne agahdar bû. Girtina Silêman Ehmed ne qanûnî ye, revandinekî çetewarî . Çawa li herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de dimeşin û kiryarên wisa tên kirin, heman hişmendî di aliyê PDK’ê ve tê meşandin. Di ti qanûna de ne hatiye nivîsandin ku endamê çapemeniye bê ku ispatek hebe bê girtin. Ji ber wê em weke endamê ragihandina azad dibêjin pêwiste ev biryar bê xêrakirin û demildest hevalême bê berdan. Ji ber ev sedema ku hevalê me tê darizandin, sedemeke sîyasî û dervî hiqûqî ye. Dibêjin Silêman Ehmed endamekî Partiya Yêkitiya Demokrat (PYD) ye. Ev sedem rast be jî PYD partiyek fermî ya Rojavayê Kurdistanê ye. Ji bona serkeftina yêkîtî û rizgariya Rojavayê Kurdistanê ev qas kar û xebat kiriye. Niha jî pêşengiya şoreşa giştî Sûriyê dike. Yanî ger rojnamevanek bibe endamê rêxistinekî fermî ev ne suc e. Nûnertiya PYD li Başûrê Kurdistanê jî heye. Ev dide xuyakirin ku armanca PDK’ê ne tenê dîlgirtina Silêman Ehmed e, armanc ne rewa nişandana PYD li Başûrê Kurdistanê ye.”

**‘Pêwêste rojnamevan bibin dengê azadiya Silêman Ehmed’**

Zinar Yildiz axivtina xwe wiha bi dawî kir: “Erkê dikeve ser milê endamên Ragihandina Azad, bername û nûçeyên tên amade kirin de, wan kiryarên ji derveyî hiqûqê bikin rojev. Siyaseta PDK’ê ya li hemberî ciwanê Kurd bê rojev kirin, ji ber raya giştî jî van mijaran agahdar bibe. Dibe rastiya ku di holê hertim bên şopandin. Deng û pênûsê endamên ragihandinê yên dîlgirtî di destê PDK’ê de, ne sekine. Ew hewil didin Silêman Ehmed kesayetî bi darizînin lê ya rastî pênus û rojnamevaniya Silêman Ehmed tê darizandin. Ev ji armanc tê kirin ku ji bona PYD û endamê wê bike armanca êrîşên dagirkeriye dewleta Tirk. Peyama me ji bona hemû dezgehên ragihandinê yên navnetewî ye, bila demildest bertek û nerazibûneke tûnd wê biryara derheqê Silêman Ehmed de bidin nişandin û tiştê pêwîst were kirin.”

# Partiya Kesk a Demokrat; Armanc û pîvan

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat, Luqman Ehmê da zanîn ku Partiya Kesk di germahiya Şoreşa Rojava de hate damezrandin. Herwiha Ehmê diyar kir ku armanca partiyê ew e jîngeha herêmê biparêze û pirsgirêka gelê kurd li Sûriyê çareser bike.**

Partiya Kesk a Demokrat yek ji partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ew xebateke siyasî li nik guhdan û parastina jîngehê dide meşandin.
Ev partiî bi Şoreşa 19’ê Tîrmehê re hate avakirin û şaxên wê li tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene. Li kantona Cizîrê 6 nivîsgeh, li kantona Reqayê nivîsgehek û li kantonên din hejmarek endamên wê hene.
Hêjayî bi bîrxistinê ye ku sîstema hevserokatiyê dide meşandin, di destpêkê de serok û cîgir bû û di sala 2021’ê de di kongreya 2’yemîn de bû sîstema hevserokatiyê. Niha Reşa Ebas û Luqman Ehmê hevserokatiya wê dikin. Ev partî kongreya xwe her 4 salan li dar dixe, di kongreyê de nav ji bo hevserokatiyê, meclisa partiyê û desteya rêveberiya wê tên destnîşankirin.
Têkildarî avabûn, pîvan û xebata siyasî ya Partiya Kesk a Demokrat, Hevserokê wê Luqman Ehmê ji rojnameya me re axivî.

**Avabûn û armanc**

Luqman Ehmê di derbarê avabûn û armanca Partiya Kesk de wiha anî ser ziman: “Ji xwe Partiya Kesk di germahiya Şoreşa Rojava de hate avakirn. Destpêkê weke girûpeke çalakvan ketin nav giftûgoyê ku karibin li gor rewşa siyasî û jîngeha heyî ya ku Rojava tê re derbas dibe, partiyekê ava bikin. Ji ber wê jî di 1’ê Berfanbara sala 2013’an de Partiya Kesk a Kurdistanî li Qamişlo hate raghandin. Piştî wê di dawiya meha Gulana 2015’an de kongreya xwe ya yekemîn hate lidarxistin. Di kongreyê duyem de navê Partiya Kesk a Kurdistanî hate guhertin û bû Partiya Kesk a Demokrat. Sedem ew bû gelek netew di herêma me de hene weke ereb, suryan û hwd… Di destpêka Şoreşa Rojava de rewşa jîngeha herêma me gelekî xerab bû, rêjeya daran gelekî kêm bû. Di heman demê de pêwîstî hebû ku partiyeke nû bi pîvan û rêgezeke nû were avakirin. Armanca me jî ew bû ku jîngeha xwe biparêzin û xebateke siyasî bidin destpêkirin. Bêhtirî xwe em derfetê bidin jin û ciwanan ku tevlî xebata siyasî bibin û bi pîvanên Partiya Kesk karê dîblomasî bikin. Partiya Kesk rêgezekê dihewîne nava xwe ku ew rêgez jî destnîşan dike ku rêjya jinan ji 100’î 40 be û ya mêran 60 be, terzî wê jî eger rêjeya jinan 60 be divê ya mêran 40 be. Di dema heyî de jî rêjeya jinan di nava Partiya Kesk de ji rêjeya mêran pirtir e. ”

**Pîvan**

Ehmê girêdayî pîvanên Partiya Kesk a Demokrat wiha axivî: “ Bê guman her partiyek xwedî armancên curbecur in û her yek ji ya din cudatir e. Ji armancên bingehîn yên Partiya Kesk; çaeserkirina pirsgrêkar gelê kurd li Sûriyê, herwiha wekheviya di navbera hemû zayendan de. Di destpêka ku Partiya Kesk hate damzrandin, sîstema wê ya rêveberiyê bû, serokek hebû û cîgirek hebû, eger serok mêr ba, divabû jinek cîgir be, terzî wiha jî dibû. Lê di kongreyê me yê duyemîn de sîstema partiyê bû hevserokatî û heta roja îro jî ev sîstem berdewam e. Di heman demê de ektîvkirina rola ciwanan di hemû warên jiyanê de, hem jî çareserkirina hemû pirsgirêkên jîngehê. Nêznbûna me ji aliyê jîngehê ve û parastina wê ne li ser bingehê hişmendiyeke radîkal e. Ango kar û xebata ku ji bo parastina jîngehê tê kirin, ne bi awayekî teng e. Nimûne; em dizanin ku erebe û kargehên cuda bi rengekî neyînî li jîngehê dikin, çênabe em erbebe û kargihan rawestînin ji ber ku ev rawestandin wê bandoreke neyînî li aliyê jiyanî bike. Lê em dikarin rêbazên cuda çareseriyekê ji bo van tiştên ku zererê li xweza û jîngehê dike, bibînin. ”

**Xebata wê ya siyasî li nik parastina jîngehê**

Luqman Ehmê di derbarê xebata Partiya Kesk de wiha domand: “Partiya Kesk salane civîna xwe li dar dixe, li ser vê bingehê xebata xwe ya salê dinirxîne, hem jî pilana xwe ya dema pêş ji bo xwe diyar dike. Di vê civînê de biryar tên standin û bi rengekî komî li ser van birayran karê piratîkî tê meşandin. Hem ji bo çakkirina rewşa jîngehê û hem jî meşandina kar û xebata siyasî kar tê kirin. Ji ber ku biryardayîneke siyasî bandorê li hemû aliyên din yê jiyanê



dike, divê her biryareke ku were standin ev biryar erênî be. Biryar û siyaseta ku aliyên siyasî yên cîhanî, hêzên desthilat û kapîtalîst dikin, tev jî bandoreke neyînî li cîhanê û xwezayê dikin. Ji ber vê yekê jî êdî rewşa jîngehê bi giştî di xeteriyê de ye, di dema heyî de jîngeh ji mirov re dibêje ku eger siyaset û kiryarên te bi vî rengî bidomin têkçûna te gekekî nêzîk dibe. Lewma em weke Partiya Kesk xebatekê ji bo parastina jîngehê dikin û hem jî karê siyasî dikin. Em salane li Bakur û Rojhlatê Sûriyê pêngava xwe ya çandina daran û parastina jîngehê didin meşandin, herwiha bîrweriya parastina jîngehê di nava gel de didin avakirin. Hêjayî gotinê ye ku me îsal nêzî 20 hezar dar li gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav kirin. Di heman demê de em semînerekê bi navê Jîngeh û Polîtîka di nava gel de didin dayîn, semînera me domdar e û ji bo civakê bi giştî tê dayîn. ”



# ‘Divê sînorek ji bo dagikeriya Tirk were danîn’

**Edîtorê ROJNEWS’ê, Baran Germiyanî da zanîn ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze bi riya siyasî serdestiya xwe li ser Başûrê Kurdistanê, herêmên Kerkûk û Mûsilê pêk bîne û ji bo vê yekê amadekariyê dike. Herwiha Germiyanî anî ser ziman ku pêwîste sînorek ji dagirkeriya Tirk re were danîn.**

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Dewleta Tirk ji bo dagikirina Başûrê Kurdistan û Îraqê hertim di nav pilan û tevgerê de ye. Li aliyekî peymanên siyasî û aborî îmze dike, li ser ruyê erdê jî xaka Başûrê Kurdistanê û Îraqê dagir dike. Têkildarî heman mijarê edîtorê ROJNEWS’ê pirsên rojnameya me bersivand û hevpeyvîn wiha bû:

**-Êrîş, hewildan û planên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Başûrê Kurdistanê û Iraqê pêre jî xiyaneta PDK’ê derketiye asta herî jor, gelo sedem çi ye?**

Diyar e ku dewleta dagirker a Tirk li ser tunekirina gelê kurd hatiye avakirin, lewma hemû hêza xwe ya aborî, siyasî, leşkerî û çandî ji bo tunekirinê bi kar tîne, bi taybetî ji sala 2015’an û pê ve êrişên xwe li ser gelê kurd di hemû aliyên de zêde kiriye.
Piştî ku dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya PDK’ê di dirêjahiya çend salên borî de êrişî ser Başûrê Kurdistanê kir û ji ber berxwedana bêhempa ya Gerîlayên Azadiyê tu encam bi dest nexist. Edî ew neçar ma û berê xwe dan hikumeta Iraqê, yanî niha PDK’ê û dewleta Tirk dixwazin Iraqê jî di lîstikên xwe de tevlî bikin. Têgihîştine ku li hember îradeya gerîla, artêşa wan tenê tune bûn û revîn jê re dimîne, bi şev û roj ji asîman û erdê ve derbeyên giran lê dikevin. Armanca dewleta dagirker a Tirk ew e ku Mîsaqa Millî zindî bike û ji bo wê hemû hewlan dide. Riya leşkerî hildibijêre û têk diçe, lewma dixwaze bi riya siyasî serdestiya xwe li ser herêmên Kerkûk û Mûsilê hebe û amadekariyê bike ji bo dagirkirina wan herêman. Me dît ku ji bo diyarkirina turkmenekî wek parêzgarê Kerkûkê, hemû hewlên xwe çir kir û rasterast serperiştiya kompoloya li ser gelê kurd dikir. Di demekê de ku dengê kurd piraniya wê parêzgehê bû, lê ev komploye têk çû û şikesteke din rastî Erdogan û hevdengên wî hat.

**-Piştî diyarkirina waliyê Kerkûkê, li Enqereyê di navbera Tirkiye û Iraqê de civîna ‘Ewlekariyê!’ çêbû. Di civînê de biryar hatiye girtin ku li Bexdayê Odeya Hevbeş a Operasyonan were vekirin û li Başîqa jî perwerdeya hevpar were dayîn, PDK’ê jî di vê planê de ye, gelo ev yek çiqasî xeteriyê ji bo gelê kurd û herêmê bigiştî bi xwe re tîne?**

Dema ku dewleta Tirk di vê komployaa jî têk çû û di êrişên leşkerî û dagirkeriyên xwe de jî negihîşt wê encama ku dixwest, ev yek di asta navxweyî ya Tirkiyeyê û navneteweyî de jî wek têkçûn jê re hat hesibandin. Ji ber vê yekê îsal gelek trafîkên dîplomatîk pêk anîn, yek ji wan jî serdana Erdogan bi xwe bû ji bo Iraq û Herêmê. Ser-



dan û hevdîtin heta 15’ê Tebaxê jî berdewam bûn, da ku di peymanek bi navê “ewlehî” de carekê bi awayekî bixwaze têkçûnên xwe veşêre û damezrandina bingeh û baregehên xwe li ser axa Iraqê bike fermî û yasayî, carekî din jî dixwaze bi temamî Iraqê tevlî wî şerê ku ew û PDK li dijî gelê Kurd bi rê ve dibin û encam bi dest naxin, bike.Di peymana di navbera Iraq û Tirkiyeyê de biryar hatiye dayîn ku baregeha Beşîqê ya ku niha artêşa dagirker a Tirk tê de ye, bibe navendeke perwerdehiya leşkerî. Ev jî bi xwe mayîndekirina artêşa dagirker a Tirk e li ser axa Iraqê, yanî ew herêm bi tevahî û bi mayîndeyî di bin desthilatdariya dewleta Tirk de ye. Ji aliyekî din ve jî biryar hatiye dayîn ku navendeke hevbeş a leşkerî û îstixbaratê ya dewleta Tirk û Iraqê li bexda bê avakirin. Bêguman ev jî bicihkirina ajendayên wan e li ser Kurdan. Bêguman ev peyman metirsiyeke cidî ye li ser gelê kurd û gelên Iraqê jî. Ji aliyekî ve bi her awayî hewl tê dayîn ku gelê kurd bê helandin, ji aliyê din ve dewleta Tirk bi vê gavê xapandin li Iraqê kir û ew herêmên ku dixwaze bi navê projeyên cuda yên wek “Rêya Geşepêdan” dagir dike û dewleta neo-osmanî ava dike.

**-Diyar e ku dewleta Tirk a dagirker dixwaze tengasî û têkçûna xwe bi beşdarkirina Iraqê ya şer re derbas bike, heta ku rê li pêşiya tevkariya PDK’ê û hemû planên dagirkeriyê were girtin pêwîste çi were kirin?**

Herçiqas li Iraqê gelek helwest û bertekên li dijî vê peymanê hatine nîşandan û wek metirsîdartirîn peyman di dîroka Iraqê de tê hesibandin, lê hîn jî helwest ne di asta pêwîst de ne. Divê hemû gelên Iraqê van metirsiyên mezin bibînin û li dijî bisekinin. Erkê hemû çînan e ku li hember van êrîş û dagirkeriyên leşkerî bêdeng nemînin. Divê aliyên siyasî xwe radestî planên qirêj ên dewleta Tirk nekin û îradeya xwe nîşan bidin. Çawa çarçoveya hevahengiyê li Iraqê razî dibe bi van dagirkeriyên? Divê helwesta wan hebe û sînorekî ji bo dewleta Tirk a dagirker deynin. Niha zêdetirî 68 hezar donim daristanên Başûrê Kurdistanê ji ber bombebaranên dewleta Tirk şewitîne û 14 welatiyên sivîl şehîd bûne û 11 yên din jî birîndar bûne. Em dibînin ku daristan û xwîna gel tu nirxek li cem hikûmeta Iraqê nemaye.

## Jinên Pêşeng di hedefê de ne



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk bi awayekî sîstematîk ji bo ku hêzên gelê Kurd ên berxwedidin ji holê rake êrîş û sûikastên xwe didomîne. Ji ber ku gerîla û gel li ber xwe dide, dewlet nikare stratejiya qirkirinê bigihîne encamê. Ji bo ku qirkirinê bi tevahî pêk bîne divê berxwedana gel ya bi rêxistinî were şkandin. Ger ku pêşeng werin berterefkirin dê ev bibe sedema hemû destkeftinên gelê kurd ji holê rakirinê. Gelê Kurd bê rêxistin û pêşeng were hîştin dê wê demê berxwedan bişkê û tu destkeftî û sengerên wê nemîne. Di roja me ya îro de gelê Kurd çi bi destxistibe saya rêxistinbûyînê ye. Dema ku gel bê rêxistin û bêzane bû di wê demê de dewleta Tirk navê wê jî bi bîr nedianî. Çima jin û pêşengên gelê Kurd rastî ewqas êrîşan tên, divê pêşiya her tiştî mirov vêya baş fêm bike û bide fêmkirin. Îro îstîxbarata Tirk, MÎT tam weke makîneyeke cînayetê kar dike. Demekî cînayetan JÎTEM, Hîzbullah û hêzên din ên tarî pêk dianîn. Lê niha MÎT, Artêş, Kurdên xayîn û çeteyên berhevkirî di van qetlîam û cînayetan de tên bikaranîn. Dewletê berê ev bi vekirî nedigirt ser xwe. Heta hebûna JÎTEM’ê jî înkar dikirin. Cînayet û pêkanînên dijmirovayî davêtin li ser Hîzbûllah û digotin destê me paqij e. Lê yên ku Hîzbullah kirin dewrê û bi kar anîn jî ew xwe bûn.
Herî dawî dewleta Tirk li Silêmaniyê Gulîstan Tara û Hêro Bahadîn qetil kir. Dizanîbûn ew jin û rojnamevan in. Êrîş li gor îstîxbarata dest wan de hatîbû kirin. Ji ber vê ne gengaz e ku ew nizanîbin di vê erebê de kî heye. Niha rayedarên dewleta Tirk û MÎT bi pesindayînê ve van cînayetan digirin li ser xwe. Destûr û serbestiyeta cînayetan girtine. Dewletên ku cînayet tê de pêk tên bê deng dimînin û çavgirtin heye. Welatên bi bandor ên wek Amerîka, Yekîtiya Ewropa û Rusyayê jî yan li van bêhuquqî û sûcên şer re dibin hevkar an jî bêdengiyê ve alîkarî û cesaretê didinê. Nagîhan Akarsel jî li Silêmanîyê hate qetilkirin. Tîma ku van cînayetan organîze dike dîyar e ku li hember jinan kîn û dijminahiyeke mezin dijî. Di Rojava de jî bi hejmareke mezin jinên pêşeng hedef girtin. Ên ku pêşengtiya Rêvebiriya Xweser dikin heta yên ku bi qehremanî lî dijî DAIŞ’ê şerkirin gelek jin kirin hedef. Pêşengiya jinan ya ji şoreşan re û bandorkirina wan ya gelan ji bo di derheqê wan de biryara kuştinê were girtin sedemeke têrker e. Ger ku ev jin Kurd bin û nêzî Tevgera Azadiyê bin wê demê jixwe mirin heq kirin e! Çavên rayedarên Tirk reş bûne.
Sedemeke ji van êrîşan li Silêmanî û derdorê wê çêdibe jî çav tirsandina YNK’ê ye. YNK wek PDK’ê neçû li ser xeta îxanetê. Alîkarî neda dagirkeriya Dewleta Tirk û li hember gerilla dijminahî nekir. Rêvebiriya Erdoxan gelek caran gef ji YNK’îyan xwarin. Sozan da û hê jî têdikoşe. Wek tê dîtin berfirehî û sedema van êrîşan pir girîng e. Yekitiya gelê Kurd tê sabotekirin. Dewleta Tirk dixwaze Kurdan parçe bike, li dijî hev bikar bîne û bi vî awayî biperçiqîne. Neyekbûna parçeyan û nebûyîna xwedî statûyê ji bo wê armanca yekemîn e.
Dewleta Tirk artêşa xwe dajo li nava Iraqê û li hember vê PKD’ya ku ji van planên xeter re dibe hevkar re bêdeng mayîn rewşeke ku were qebulkirin nîne. Dê kî vê artêşê ji Başûrê Kurdistanê derxe? Ên ku dagirkeriyê re dibin hevkar, alîkariyê didin rijandina xwîna Kurdan, dê pêşerojê çawa plan bikin? PDK dê ji dewleta Tirk re bêje: ‘’Leşkerên xwe bikşînin, wê wisa soz dabû me?’’ Ne mumkun e. Dema ku beşeke gelê Kurd ji dagirkeriyê re bibe hevkar wê demê ma yên ku li Iraq’ê rûniştine dijî dewleta Tirk derkevin? Ew jî nabe. Ên ku xwedîyê malê ne gazî dagirkeran dikin û du re jî dê bibêjin ‘’Çi halê wan heye bila bibînin.’’ Jixwe ya ku niha dibe jî ev e. Erdoxan proje û teklîfên nû bir pêşiya Baxdayê. Ew jî dixwazin sûdê ji şerê dijî Kurdan pêk tê werbigirin û li Başûrê Kurdistanê zêdetir bibandor bibin. Ji ber vê tevlî van planan bûn.
Çapemeniya PDK’ê li Rojava bi bihayê genim re eleqedar dibe. Tiştên ku pêk tên dixwazin li gor xwe biteysînin. Ji bo ku Rêvebiriya Xweser teşhir bikin û binketî nîşan bidin pir hewl didin. Lê belê Başûrê Kurdistanê bi leşkerên Tirk hatiye tijî kirin, çiya û zinar tên bombebarankirin, erazî û daristan dişewitin, gund tên vala kirin. Di wê erdnîgariyê de qiyamet rabuye (Dinya xirabuye) lê çapemeniya PDK’ê wek tu tişt nebuye dikare tevbigere. Dikare zimanekî wek bêalî ya ‘’Şerê di navbera Dewleta Tirk û PKK’ê de’’ bi kar bîne. Li ser erdê wan du hêzên biyanî şer dikin û çapemeniya PDK’ê jî di rewşa bêalîbûnê de ye! Hûn alîkariyê nadin PKK’ê, welatparêziya we nemaye lê ma hûn mecbûr in alîgiriya Dewleta Tirk ya ku dixwaze Gelê Kurd bi destkeftiyê wê ve ji holê rake bikin? Jinên ku hebûna xwe di oxira gelê xwe de dane û pêşengtiyê dikin, nîşandana wan wek PKK’yî yan jî ‘’Mirin heq kirine’’ dê exlaqê kîjan çapemeniyê û kurdewariyê ve were ravekirin?
Çapemeniya PDK’ê qetilkirina gerîlla, ronakbîran û welatparêzan bi gotina ‘’PKK yî ne’’ ve rewa dike. Çapemeniya ku divê gel ronî bike bi destê PDK’ê ve rastîya berovajî dike û vegeriyaye amûreke ku dijmin û kujeran paqij dike.

## Li dijî Kurdan peymanek nû



**Farûk Sakik**

Nizanim, li Milazgirê bapîre me li wan (Selçûkî-Tirk) re, derî vekirin ku ketin Anatoliya, anjî Kurd neçar man li wan derî vekirin. Îroj li Xelatê ew fotografê Erdogan û çend dijminên Kurdan bi hevre parvekirine, her wek bibêjin rolek Kurdan di şerê Milazgirê de tunebû. Dîroknas dibêjin, 10 hezar şervanên Kurd di nav artêşa Alparslan de cîh girtibûn. Di serkeftina vî şerî de rola herî mezin ya van 10 hezar şervanî bû. Kurdan bawerî anîn ku ev bibe wek destpêka yekîtiya Kurd û Tirkan. Nebû.. Her çiqas hetanî dawiya împaratoriya Osmaniya, Kurd bi awayek Kurd dijiyan jî, bi damezirandina Komarê re êdî her tişt hat guhertin. Red û înkar destpêkir.
Kurdistan hat parçekirin. Hejmara dagirkerên Kurdistan bi demê re derket 4’an.
Çeteyên Oguzan çawa dihatin talan dikirin û gelên li heremê bi komkujiyan tune dikirin. Kemalîstan jî ev yek ji xwe re mînak girtin. Gel û netewên li Anatoliya dijiyan yek bi yek tunekirin. Lê Kurdan liberxwedida û bi tu awayek serî neditewandin. Serhildanan destpêkiribû.
Di serhildanan de Kurdan, ew sînorên di navbera wan de hatibûn xêzkirin-parvekirin nasnedikirin. Dewleta Tirk a dagirker, ji dewletin dagirkerên dinan alîkarî dixwest. Peyman û mutabaqat îmzedikirin. Di 17’ê Tîrmeha sala 1937’an de li qesra Sadabadê dagirkerên Kurdistan hatin cem hev û peymanek ji 10 xalan pêkdihat îmzekirin. Xala 2 yan û ya 7’an li dijî Kurdan hatibû amadekirin.
Di 15’ê Tebaxa 2024’an de li van peymanan, li Enqerê peymanek dinan hat zêdekirin. Di navbera Dewleta Tirkiyê, Iraqê û PDK’ê de li hevkirinek hebû. Esas naveroka peymanê tunekirina PKK’ê hatibû hedefkirin. Lê di demek kurt de derket holê dewleta Tirk a dagirker li du hin planên nû ketiye. Em li siyaseta Tirkiyê ya van demên dawî binhêrin. Li welatên derdora wî li kuderê kaos û şer hebe bi daxwiyaniyên xwe, çekên xwe, dibin aliyek vî şerî. Her wek helwesta wan ya di şerê Azerbeycan-Ermenîstan, Sûrî navxweyî û di Ukraniya de.
Lê îroj şer derbasî Rojhilata Navîn buye. Di pêvajoya şerê Sûrî de ji bo Kurd û Kurdistan nebin xwedî statuyek, hin kesên dijminê netewa xwe yên wek ENKS li Enqerê di civînan de hin peyman da îmzekirin û ew bikaranî.
Dema ku dît li vêderê nikare gavek bavêje û Beşar Esad, di vî şerî de bi serketî. Lawakir. Lê pere nekir. Ji bo tunekirina tevgera azadiyê li rêyek dinan geriya. Derbasî Iraqê bû.
Bi PDK’ê re lihevkirin( li ser planek nû). PDK’ê jî bi hikumeta Baxdayê re lihev kir. Çûn û hatina îstixbaratan û xebatên dîplomasiyê, di 15’ê Tebaxê de, bi peymanekê bi dawî bû. Lihevkirinê zêdetir, herdû aliyên dinan teslimî Tirkiyê bûn. Wek sadabadê di her xalên vê peymanê de jî peyva “sînor” derbas dibû.
Dewleta Tirkiyê dixwaze, bi vê peymanê û bi van herdû îmzeyan, di pêşerojê de di parvekirina Rojhilata Navîn de para xwe ya dagirkirina Iraqê mîsoger bike. Ne bi tenê Başûrû Kurdistan,( ji xwe ev herem hatiye dagirkirin) derveyî sînorên Başûrê Kurdistanê hin deverên dinan jî bidest bixe.. Lê li pêşiya vê plana wan bi tenê tevgera azadiyê-PKK’ê heye. Dixwaze bi vê peymanê PKK’ê tune bike. Dema ku em li raboriya PKK’ê dinêrin, wê PKK’ê binkeftina dewleta Tirk a di vî şerî de bibîne. Lê Erdogan û nîjadperestên li bajarê Xelatê(Ahlat) poz dane, wê tu carî nebînin ku PKK’ê di vî şerî de çiqas nêzî azadiya Kurdistan bûye.